

## Belgeya seknandinê: Piştgiriya başbûna zarokê xwe bikin

### Agahiyên dê û bav/çavdêran

#### Çawa piştgiriya zarokê xwe bikin

Cihekî baş yê destpêkirina dema piştgirîkirina tenduristî û bextewariya zarokê we di dema seknandinê de berhevkirina agahdarî û şîretên pispora ne. Ji bo şîret û agahdariya pratîk ji bo piştgirîkirina başbûna zarokê xwe van çavkaniyên di vê rupelê de bişopînin:

- Bextewarî ([Wellbeing](#))

Têkiliya erênî û vekirî ya di navbera mal û xwendegehê de ji xwendekaran re dibe alîkar ku şansê serfiraziyê çêtirîn peyda bike.

- Zarokê xwe piştrast bikin ku ew endamekî girîng yê civata xwendegehê ye.
- Xemên xwe ragihînin xwendegehê.
- Bi tîmê xwendegehê re bi hevkarî karbikin da ku stratîjiyên ku piştgirîya beşdarbûna zarokê we di fêrbûnê de dikin pêşve bibin û bicîh bînin.
- Beşdarî civîna plansaziya vegera zarokê xwe bibin. Dibe ku ev rû bi rû, serhêl yan bi tîlefonê be.
- Bi zarokê xwe re li ser reftarên guncav yê ku hawîrdorên fêrbûnê yê erênî, ewledar, berfireh û rêzdar bipeyivin.
- Zarokê xwe teşwîq bikin ku bi rêzdarî fikir û ramanên xwe parve bikin.

#### Fêrbûna ji mal di dema seknandinê de

- Endamekî karmend dê di dema seknandinê de bi rêkûpêk bi we û zarokê we re têkiliyê deynin.
- Bi danîna demên zelal ji bo demên kar yê di nav rojê de, peydakirina cîhekî bêdeng, û bipirsîn ka fêrbûna wan çawa pêşve diçe, alîkariya zarokê xwe bikin ku fêr bibe.
- Piştirast bikin ku brêkê wan hebin, avê vexwin û ger strêş û xem çê bibin piştgirî bidin wan.
- Ji bo çalakiya laşî demê bidin.
- Çavdêriya zarokê xwe bikin ku teknolojiyê bi ewlehî bikar bîne. Malpera Bikaranîna Teknolojiyê ([Using technology](#)) agahdarî û çavkaniyên ku hûn dikarin bikêr bibin hene.

#### Girêdanên Alîkar

- Pakêtên fêrbûnê ([Learning packages](#))
- Şêwirmendiya fêrbûnê û piştgirîkirina astengdaran ([Disability learning and support advice](#))
- Amûrên desteka reftarê: Piştgiriya ji bo dêûbavan ([Behaviour support toolkit: support for parents](#))
- Alîkariya zarokê xwe ji mal fêr bibe bike ([Helping your child learn from home](#))
- Xeta Alîkariya Zarokan ([Kids Helpline](#)) yekane xizmeta şêwirmendiya tîlefonî ya belaş e li Australya ji bo kesên 5 heta 25 salî. Telefona 1800 55 1800 bikin.

#### Xizmeta wergerandina telefonî

Heke hûn dixwazin bi xwendegehê re têkiliyê daynin û ji bo Îngilîzî hewcedariya we bi alîkariyê heye, ji kerema xwe telefona xizmeta wergerîyê 131 450 bikin, ji wan re bêjin hûn çî zimanî diaxafin û ji operator bixwazin ku telefona xwendegehê bike. Operator dê wergêr li ser xetê peyda bike da ku alîkariya we bike. Ev xizmet bê pereye.